Çand
û
Huner

agahdarî

Gulan
=
1996

Weşana mehane ya Enstituya Kurdî li Brukselê

Nr. 4

dabaş

BERPIRSIYARÎ

Bêgoman cîhan dizîvire û mirovanî ji di nava guhertinên pirr xurt û fereh û bihêz de ye. Jiyan jî li gorî guhertin û demê pêwîstiyan dixwaze. Herwiha pêşketin û bersivdana demjiyanê bi vê pêwistiyê ve girêdayî ye. Kes, bi giştî dinava jiyana berdewam de nabe war. Ax û cih û hebûna dezgehan, yanî sazî û avanî war in. Hebûn in... Mirov, kevirek ji ê wî warî ye... Qet nabin bingeh... Helbet mirov rolê dileyize,
lê temenê mirov, pêwistiya nifş bi nifş û nobedariyê derxistiye meydanê. Lewra jî, mîna her kesî, em
Kurd jî pêwistî vê rastiyê ne. Tu mirov ne bûne stûna jiyanek berdewam. Piştî têkçuna tu mirovî jî, jiyan ne rawestiya ye û tofana malkambax ne rabû ye. Ne piştî Sezarê çaq xwar, ne piştî Skenderê serî ga, ne piştî Napolyonê qam qut, ne piştî Kleopetra Keçel û Nefertîtî ya poz şujin û ne piştî Edîson û Marx û piştî wî mirovê ku hejmara PÎ dîtî... Yan jî piştî Nuh û Pêxemberên din... Jiyanê her û her berdewam kiriye. Kes hatine û çû ne, lê jiyanek têr qerqeşûn û mirovaniyek têr pevçûn hatiye û bûriye... Demjiyana îro jî, wê bi bihure... Em teva, bi rol û ne bi rol, roj wê bê ku herin. Lê, Kurd û Kurdistan her wê payîdar be... Xwedî û berpirsiyariya Kurd û Kurdistanê di rewşek nebotî de û dest ji dest, wê berdewam bike. Hêvî ew e ku ev rewş her roja ku bê, wê bêhtirîn geş û xurt û bi hêz bibe. Mêrî çê ew e ku dikaribe demjiyanek birûmet û xîret berhimbêz bike û kefa mista xwe nedê ber çepeliyan. Helbet hêlek jiyanê çepelî ye... Lê, demjiyana îro mirovên Kurd bilî çepelî û rûreşiyê, pêwistî gavavêtinên stewihayî kiriye. Dîtin û raman çi dibe, berpirsiyariya her mirovê Kurd e ku giran, sivik, barekî hilgir e. Ne mîna Makyawel gotî 'hinek mirov nan pêjin, hinek mirov jî, hejik kêş in.' Her çiqasî pêşgotina pêşiya be jî, di hêla zansitî de gotina wî ciwamêrî xweş tîne ziman. Her kes berpirsiyarê jiyanê ye. Wilo xuya dike ku hinek kes li nav û pesin digerin, hinek kes jî barhilgiriya hemdemî diragirin. Helbet dîrok jî wê li gorî vê rastiyê werê xêzik kirin.

Derwêş M. FERHO

SEMÎNERA M. FERHO LI SER ROMANA KURDÎ BALKÊŞ BÛ

Di çarçeweya programa salane ku Enstituyê daye ber xwe, meha Gulanê jî bi xurtî berdewam kir û yek ji van semîneran li ser **Romana Kurdî** bû. 13 Gulanê, ji teref **Medenî Ferho**, saet li 14 an bi dabaşa pirtûk û kaxezan ku şaxek ji ê karbidestiyê ya herî xurt û pirrhêlî ye:(Dar/Kaxez/Çapxane/ Nivîskar/Weşan/Wênekêş/Boyax/ Pênûs/Firçe/Avanî/Hesin/Karxane / Dikan= Karkerî/Dirave) ku mîna xelekên zicîrê bi hevûdin ve girêdayî ne dest bi axaftina xwe kir û dîroka romana yekemîn ku ji teref **EREB ŞEMO** di sala 1935 an de bi navê **Şivanê Kurd** hatiye nivîsandin, anî ziman. **Medenî Ferho,** got ku: *'Her çiqasî li gorî têgihiştin û encama romana Cîhanê, romana Kurdî ya yekemîn ya Ereb Şemo be jî, li gorî min, romana Kurdî ya yekemîn Mem Û Zîn e...'* piştre bi cûdabûna di navbera çîrok û romanê de axaftina xwe berdewam kir û mînak li ser pirtûkên Kurdî dan. Û dabaş li ser naverok û avakirina hûnandin û ramanê Kurdî di hêla ekolan de diyar kir. Got ku: *'ev cûdabûna navbera çîrok û romanê, li gorî pîvana giştî jî diyar e ku Mem Û Zîn di avakirin û hûnandina xwe de, bi bûyerên ku li dora serkêşên pirtûkê têne hûnandin û fereh dibin jî, her çiqasî di rewşa helbestî de hatibe nivîsandin jî, bilî destana lîrik, epopeya Kurdî bi pirrnîgarî têde cihê xwe digire.Heger hinek kes hemberî vê dîtinê der bikevin û bêjin, destan kîjan demê bûne roman, mirov dikarê pirr mînakên Cîhanê, weke ILYADA û ... nîşan bide'.* Herwiha Medenî Ferho axaftina xwe anî ser dabaş û naveroka romana Kurdî di hêla bingehîn ku bi tevayî, pêşî û dawî, realîzm serdariyê dike. Bi mînakan axaftina xwe wiha domand: *'Romana Kurdî, ji destpêkê û vir de realîzm hakim e. Lê, em guhertinê di romana Mehmet Uzun ya bi navê Rojek Ji Rojên Evdalê Zeynikê de dibînin. Ev guhertin romantîzm e. Guhertina duyemîn jî, di roma min ya bi navê Berxwedan Jiyan e de sembolîzm, yan jî surrealîzm heye.* Herwiha gotin hat û li ser karbendiya nivîskar û berpirsiyariya nivîskar rawestiya. Mînakên klasîk û hemdemî jî, hatin diyar kirin ku her nivîskarê mezin, hinekî jiyana xwe nivîsiye û ji pêpelûka devê deriyê xwe dest pê kiriye. Lewra jî, nivîskarên Kurd pêwistê ku ji pêpelûka devê deriyê xwe dest bi nivîsandinê bike, bersiv û daxwaz û pêwistiya gelê wî li ber devê deriyê wî û resîfa hember pêpelûka devê deriyê wî ye. **Medenî Ferho**, li ser vê pirsgirêka ku îro di nava nivîskarên Kurd de bi xurtî dabaşa galgalên têr lom û gazin e rawestiya û gotin anî ser guhertin û nûjeniya dinava koma civata Kurd... Got ku: *'Şerrê civaka kurd pirr guhertin û nûjenî êxiste hêla civatê, hêla çand û wêje de. Ev şoreşa têr bedel û ku giranbihayiya wê neqam e, hin bi hin mêweyên xwe derdixe meydanê. Di pêşerojan de jî hê bêhtir û xurttir ev geşî wê xuya bike.'* Gotin bi qedexekirina ziman, çand, dîrok, wêje û nivîsandinê ku ji teref dijminê Kurdan ê hov û xedar berdewam kir û mînakên gelên din mîna Ermenî û Ruman, yan jî Lazan hatin ziman. Her çiqasî qedexekirin di masetê de be jî, gelê Kurd hebûna xwe ku ra û şaxên dîrokî di nava demsalê kevnare de kûr û dûr in, hemberî zordestiyê û talanî û wêraniyê wêjeya devkî bi xurtî û pirrnîgarî ava kiriye. Destanên mîna **HEVÎN Û HEJAR, SÎYABEND Û XECÊ, MEMÊ ALAN** û hwd. derxistine meydanê. Bilî van, **Medenî Ferho.** di dawiya axaftina xwe de got ku: *'Romana kurdî li pêşiya çîroka kurdî ye.Çîrok misrî ye... Roman bi hêz e... Her çiqasî kesên mîna Firat Cewerî di hêla çîrokê de berhemên nemir dabin jî, rastî ev e... Û dive ku em ji bîr nekin ku Ereb Şemo, ne mîna Karlanê Çaçan gotî bavê edebiyata kurdî ye, bavê romanan kurdî ye. Ji ber ku ava kirina wêje pirhêlî û pirnîgarî ye.Her wiha kesên mîna Mîr Celadet Bedirxan, kesên mîna Qanadê Kurdo hene.'* Axaftina dawî, bû mîzenpaj û nîgariya pirtûkan ku haletek ji ê bazirganiyê ye û bivê nevê dikevê nava çarçî û kolanên bazarê de. Lewra jî, weşana pirtûkan pêwist e li gorî vê rastiyê bête kirin.

www.arsiv.org

NÛJENÎ LI SER BINGEHÊ KEVN AVA DİBE

Xêro ABBAS

Nûjenî tune ye!... Her nûjenî di bingeha xwe de kevnariyekê diragire. Di her warê jiyanê de ev dabaş heye. Nîgariya pirrhêlî vê nîşan dide... Cil û temtêla demjiyanên curbecur di tevgera koman de mîna xelekan duvdirêjî hevûdin dibin. Bêgoman, govenda kurdî di destpêkê de ne bi pirrkesan dest pê kiriye. Lept û livandin jî ne di vê qonaxa rîtmîk de bû. Weke îro ku govend bi cil û kincên normal yên rojane, yan jî cil û kincên paqij ku ji sendoq û xurcezînan derdikevin tê leyizandin. Lê, di govend û dîlanên fermî yên komarî, yan jî di pêşbazyên navneteweyî de, cil û kincên neteweyî têne lixwe kirin. Helbet ne ev bi tenê ye... Pirraniya caran yek nîşanî tenê dibe ala fermî... Herwiha, di muzîkê de ev rewş darî çavan e. Weke stran û mamik û dîlok û dîlanên di nava gel de... Yan jî ew hunermendên ku bi navê mitirbî têne nas kirin ku bûne stûna çanda kurdî ya devkî... Hin di hêla dîrok de, hin di hêla tolî de... Û bi teva ve girêdayî folklorîk... Weke tê zanîn folklor ne bes govend û dîlan in... Folklor jiyana gel bi giştî berhimbêz dike. Ji palûta genim û avaniya bigrin heya bi berdolab û şehriye birîne dot û jinan û bêrîvaniya devê kanî, çal û çeman... Bilûr û lorandina şivanan jî di nav de ye... Tewirandina Şalûl û Bilbilan, Fîqêna Tîtî û Başoke û zûrêna rawîrên berrî û girî û bêhnefişka zarokan, lîlelîl û dilojarêya jinan teva di nava vê hunandinê de cihê xwe digirin. Û her li ser bingehê kevnar ronahî dîtine, di berdewama jiyanê de kirasekî din li xwe kirine. Awaza dijwar, nerm, qalin û zirav, yan jî pirrdengî û qewlên ji teref du sê qewal yan jî pîran têne xwendin teva pêpelûk bi pêpelûk gihane îro... Heger tembûra yekemîn ji kundirê bi stirih, yan ji qurredarekî nava wî vala be, îro bû ye ji dara şêmî... Heger têlê kemançê, pêşî ji mûwê dêl û bêjiyê hespan bûn, îro bû ne karbidestiyek bazirganî... Heger bilûra Mamê Şivan, berê bangî Miha Reş dikir û hêviya evîndariya dilsotî dianî ziman, îro bû ye awaza şahrevaniya mirovaniyê. Ku em dubara bikin, nûjenî berdewama jiyanê ye, lê kevn jî bingeha jiyanê ye.

DESTANÊN KURDÎ

Zozan Ozmaniyan

Ew yek, ku folklora kurdî pirr dewlemend e, pêwîst nîne bê mak kirin. Kurdnas û rojhilatnasan ji zû de ew yek gotine û pejirandine. Lê, gelo em çawa li wê folklora xwe xwedî derdikevin. Û divê em li xwe mikur bên, wekî ta îro jî mixabin komele û rêxistinên me guhdariya hêja na dine vê pirsê... Di rojên me de, gava televizyon, video, rekord û radio şuna folklorê di dema me de roj bi roj biçûk û teng dikin, rojek jî wê bê, emê hew bi xwe bihisin ku ji wê folklora dewlemend kêm tişt ma ye û di dûverojê de em yek wê tu caran neyê lê buhurandin. Folklor di uja xwe ya dûr û dirêj de anegor çerx û dewranê, navçe, zarav bê guhertin. Bêgoman pirr nimûne winda jî dibin. Ew guhertin, çawa di nava folklorên gelên mayîn de, wisa jî di nav folklora gelê kurd de li ser bingeha sîstemên xurt pêk tên. Ew sîstem jî, ji aliyê xwe de, di dewran û guherînan de tên guhertin, lê ne bêhtin.

Ew sîstem bi gişt evîn: Sîstemên janza, tîpa, nexşe, lada, rîtma û hinekên mayin. Ev sîstem jî, ji aliyê xwe de bi hev re girêdayî ne. Her nimûneke folklorê, ew nû be, yan kevn, şûna wê ya taybetî di sîsîtemên curbecur de heye.

Di vê dewrana me ya kompozîtoran de, heger em bikaribin bi zanyarî xasetên wan nimûneyên taybetî şîrove bikin, anegor xwetînên teorî wan analîz bikin. Wê demê şûna wan nimûneyan yên di sîsîtemên anegor de wê bê ber çavan. Lêkolîna zanyarî, ya nimûneyan folklora Kurdî ya sazbendî ye. Cîwarkirina wan di sîstemên anegor de, wê alî me bike û bersiva gelek pirsên folklornasiya kurdî bidin. Wê bibe bingeh ji bo diyarkirina taybetî ya sazbendiya kurdî û pêşveçûna wê. Wê ji bo kompozîtor û sazbendên kurd bibe rênas.Emê di vê gotara xwe de li ser destanên folklora kurdî rawestin. Ew di nav gel de wisa jî bi navên beyt/serpêhatî tên nasîn.

Di vê gotarê de, em dê berî teva li ser wan materiyalên binax, winda rawestin. Yên ku li Ermenistanê û komarên Sovyetistanê yên kevn peyda dibin...Dive ku di vê qonaxê de hinek tişt ji aliyê zanyarên kurd û Ewropî de jî hatibe kirinê. Lê, me nikarîbû lêgerînên wan yên çapkirî peyda bikin. Nimuneyên destanên kurdî di koleksiyona konsolosê Rusya li Erzeromê Aleksandir JABA de hene. Ew, wisa jî, ji hêla zanyarên Ermenî, C. Sirvanstiyan, Ş. Haykunî, klasîkê sazbendiya Ermeniya Komîtar, sazbendnasên Ermenî, S. Melikyan, A. Koçariyan de hatine berevkirin.

Di salên 1930 de kurdnasên Sowyetistanê dest bi wî karê pîroz dikin. Kurdnas Heciyê Cindî, çend şaxên destana 'Ker Û Kulik, Siyamendê Silîvî' bi lêgerîna zanyarî çap dike. Bi lêgerîna teksên destanê folklora kurdî wisa jî, M. Rudenko, O. Celîlov, J. Musoêliyan mijûl bû ne. Lê mixabin hinek zanyaran bi tenê tekstên wan destanan berev kirine û lêgerîna wan kirine. Lê, hinekên mayin, sazbendnasê sazbendiyan ew destan berhev kirine. Bi note nivîsîne û lêgerînên awazên wan kirine.

Şeva Çandî
Şemî, 6.7.'96
Aslîka Kadir, Brader,
Temo, Ronî, Serwan,
Şêrgo û Medo Kurd
Bilêt bi xwarinê re
500 Fr.
Reservasyon: Enstituya Kurdî
Tel. 02. 230 89 30

www.arsivakurd.org

BERJEWENDÎ Û KURD

Mehemed QAWAS

Dema ku gel daxwaza xurt û bihêzkirina berjewendiya xwe bike, dive ku berî her tiştî çavên xwe veke û hinekî li cîhanê temaşe bike. Mixabin em Kurd ne wiha ne... Em Kurd tiştekî din in... Em, bi çavên korîk (qurç) li cîhanê dinêrin. Lewra jî pirr tiştan nabînin. Helbet ev nabe sedema gavavêtinên hemdemî. Li ser vê yekê gelek tişt têne bîra mirov. Ku mirov bîne ser ziman û di vî warî de bide xuya kirin. Dive mirov rastiya dîroka Kurdan rast nas bike, heger ku ne wiha be, tiştek ji hevûdin nayê safî kirin û kesek nizanê ku kî li pey çiye? Di vî warî de mirov dikarê gelek tiştan weke mînak bide nîşan dayin. 'Hinek kesan xwestiye ku di dezgehên Kurdî de berjewendiya xwe biparêzin.' Ji wan kesan weya ku kesek ji wan agahdar nabe. Helbet roj wê be ku ev pirs ji wan bê kirin û tewanbariya wan bête pêçavên wan. Mebesta min ew e ku bê rawestandin ez, li ser wan kesan bêjim û bibelînim. Ji ber ku hinek bûyer û pêkhatin hene ku dilêşandine. Pêwiste ku mirov berjewendiya xwe nekê pêşiya berjewenda gel.

Heger mirov rewşenbîr be, yan jî zana be, dive ku mirov li gorî ê zanistiya xwe û têgihiştina xwe kar û xebatê bike, bo bibe rewşenbîr û zanayê gelê xwe. Ev pirsgirêk ji bersivdana daxwaz û hewceyiya demê tê. Gelo wan hey ji bûyer û demjiyana îroyîn tune ye?

Gelo na bînin bê gelê Kurd di çi qonaxê de ye? Tiştê ku dijminê kurdan ji bo komên xelkê kurd rewa dibînin, gelo ew çima pê naêşin? Ez her dibêjim, ji berê û paşê de her dem kurdan li her dem kurdan li hevûdin weha kirine, ji bo vê yekê ye ku îro kurd li paş hemû gelên cîhanê mane. Li dawiya sedsalên bîstemîn, Kurdan gelek gavên zexm avêtin. Di welatên cîhanê ya rengareng de sazî û dezgehên xwe damezrandin e û pirsa kurdan bi cîhanê, bi xurtî didine nas kirin. Rewşenbîro, zanayê berjewend parasto, tê çi kir? Firaza te çî ye? Tu zîvirî û rûn li ser savara xwe de rijand. Ez wisa bawerim ku tu di derbarê berjewendiya xwe de jî ne xurtî. Xurtiya te jî, mîna dîroka te ya tarî ye. Heger ku te berê jî kariba ne tiştek havil (safî/paqij) bikirane, bêgotin te yê niha jî dikarîba ye. Mirov hewqas diêşe ku, çima em wiha mane ne zanayên xwe bi xwe. Mêjiyê min mijul dike, gelo zanayên me çima ne mîna zanyarên xelkê ne? Xwezî me jî ji berê de dikarîbane berjewendiya xwe biparastane. Herwiha bi destê kesî ve ne berdane... Mixabin me her dem kiriye û bi xelkê xwarin daye. Ji berê de, di kuraya dîroka me de kurdan serê birayê xwe ji bo dijmin jêkiriye. Berjewenda gelê xwe bi destên dijminde berdaye. Lê car din dibêjim ku hêvîdarim...

Hêvîdarim ku ew kesên me yên wiha, parîkî dest bidin ser ujdanê xwe û li aliyê gelê xwe temaşe bikin. Ne bes em, cîhan teva wiha ye. Ta ku mirov bi hevûdin re rast nebe, nikarê bibe xwediyê tiştekî bingehin û bi rêkûpêk. Berjewendî gelek xweş e... Lê ku berjewendî bi berjewendiya gel ve girêdayî be. Xizmeta herî mezin di roja îroyîn de ew e ku her rewşenbîrê kurd bi hemî îmkanên xwe çanda kurdî bi awayekî pirralî û ji bo bedewbûna vê çandê hunda nebe bi bêhna fereh ji dinya derve re binivîse, bi neqişîne û pêşan bike. Dema rewşanbîran ev kir qedrê wan mezin dibe.

WEŞANDINA PIRTÛKAN LI SOWYETISTANA BERÊ

Wezîrê EŞO

Me di nivîsara bihurîde da kifşê ku îmkanên herî qenc ji bo pêşdebirina çanda Kurdan li Ermenistanê ji destpêka salên 20 î hatin sazî kirinê. Kurdên Ermenistanê ji ber asîmîlekirina bi destên zorê jî filitîn ku ji salê 30 î li Azebaycanê hindava Kurdan de dihate kirinê. Heger, rastî dixwaze em bêjin ku polîtîka asîmîlekirinê wê demê ne pêşê serwerên Ermenistanê, rewşenbîrên Ermenî û gelê Ermenî bû. Xasma rewşenbîrên Ermenî yê ku di nava Kurdan de mabûn, zimanê Kurdî, tol û adetên Kurdan dizanîbûn, hey ji polîtîka serokên Tirkiyê hebûn, nîjadkujiya gelê xwe bi destên dewleta Osmanî dîtibûn, ser vê yekê hewnê rast bûn ku qedera gelê Kurd û ermenî ya dîrokî mîna hev e, dijmin, xenîmê serê wan jî yek e: Hikumeta Tirkiyê... Ermeniyên ku ji ber gire, jenosîdê filitî bûn, wisa jî hey jê hebûn ku Kurdên Dêrsimê, Kurdên Êzdahî li Laleşê û Şengalê û navçeyên din bi deh hezaran Ermenî ji girê, kuştinê xelas kirine. Lewra jî yê mîna LAZO, bi helalî dest bi xizmetkirina hindava xwendin û çanda Kurdan kirin.

Pey Alfabeya Lazo, salên 30 î li Ermenistanê dest bi hilanîna nexwendîtiyê kirin, ji nava Kurdan, dibîstanên elementerên pêşin li gundê Kurdan de vekirin. Ev kar wisa jî li Tiblîsê hate meşandinê. Li wira LAZO dibistana serbûhêriyê seba zarokên Kurdan sêwî, yanî bêxwedî vekir. Mamoste, yanî dersdarên dibistanên gundê Kurdan yê pêşî jî Ermenî bûn. Yên ku bi Kurdî rind dizanîbûn û hêsa ji bin barê fêrkirina wan zarokên Kurd derdiketin, yên ku zimanê Ermenî nizanîbûn. Alfabeya LAZO, heya dawiya salên 20 an pirtûka fêrkirina xwendinê ya tenê bû.

(Dom dike)

www.arsivakurd.org

ROJNAMEGERÎ Û ÇEND TEYBETIYÊN WÊ

Mazhar GÜNBAT

Eger tarîfek ji bo rojnamegeriyê bê kirin bi awayekî giştî û kurt wê wek karê ragihandin, bi şêweyekî îndîrekt perwerdekirin û wek armanc jî, li gorî xwe guhertin û heta di maneyekê de jî wek manîpulekirin dikare bê tarîf kirin.

Dîroka karê rojnamegeriyê, eger bi ya gelek meslekên din re bê muqeyese kirin, zêde ne kevn e. Di maneya meslekî de û bi sîstemeke nûjen, bi pêşketina navgînên rêgihandin û teknîka çapê, ber bi sedsala 17 ve ev meslek xwe didamezirîne û pêl dide.

Rojnamegerî, ji ber hin pêdiviyên civakî, bazirganî, hinek jî edebî û zanistî dest pê dike, bes bi pêşveçûna teknolojiyê derfet û teknîkên wê, pir zêde dibin û tesîrê li jiyana civakê dike, civakê ji pêşveçûnên her warî haydar dike, agahî û zanînên gelek waran ji bin kontrola çîneke bijarte dertîne.

Piştî demeke din, tesîra wê ji rola wê ya meslekî û ji çarçoveya armanca hebûna wê dibore û dibe mîna hêzeke siyasî. Wisa dibe ku êdî di hêla siyasî de jî dike ku nêrîn û ramanên mirovan û pê re jî, yên kom û civakan biguherin.

Piştî ku ev tesîra wê wisa zehf dibe û dibe xwedî roleke mezin di guhertina dîtin û awira raya giştî de, serdestên civakê hêdî hêdî dest davêjin vî karî û hêza wê hîn mezintir dikin.

Di nav her welatê ku bi sîstema komarî tê îdarekirin, rojnamegerî li pey hêzên qanûnçêkirin, birêvebirin û darizînê, dibe hêza çaremîn. Li ser rûyê cîhanê tu meslekê civakî an jî rewşenbîrî ji xeynî çapemeniyê, di vê maneyê de nebûye hêz. Girîngî û rola meslekê herî peşketî jî, bi yên rojnamegeriyê re nikarin bên muqeyesekirin. Di dawiya sedsala 19 de ew mîna hêza çaremîn hatiye bi nav kirin.

Îro êdî tê gotin ku ew ji rêza çaremîn ber bi jor ve hilkişiyaye, ango bûye hêza duyem an jî yekem. Bi awayekî fermî û hiqûqî ne be jî, bi awayekî objektîf wisa ye.

Tu warê meslekî bi qasî çapemeniyê ne bi şens e di sûdgirtina ji pêşveçûnên teknolojîk û zanistî de. Bê guman her meslek bi awayekî û bi mîktarekê ji van pêşveçûnan îstîfade dike, lê, ne bi qasî çapemeniyê. Teknîk, pisîkolojî, sosyolojî, dîrok, ziman, wêje, teknîka reklamê, wênekêşî, huner, grafîk, îstatîstîk û gelek warên din, heta zanîsta siyasetê jî, îro ketine bin xizmeta vî warî.

Li aliyê din, berê tu meslekî, bi qasî yê çapemeniyê ne fireh e. Ew xîtabê hemû bir, û nifşên civakê dike. Ev tişt tev derfet, avantaj û hêsaniyên vî karî ne.

Feqet dezavantaj, dijwarî û zehmetiyên wî jî, her wiha zêde ne. Ji bo karekî ku ji ew çend waran îstîfade dike, ji aliyê meslekî ve pisporî û pirzanebûnî dibe pêdiviyek.

Rojnamevanek eger bixwaze heqê vî karê berfireh û bitesîr bidê, pêwist e ji estetîkê bigirin ta psikolojiyê, ji siyasetê bigirin ta aboriyê, ji teknîkê bigirin ta dîrokê û hwd. bi gelek zanînan, xwe bixemilîne û bi taybetî jî, di şaxekî rojnamegeriyê de jî, bibe pispor. Wekî din, şev û roj û cih û war jî ji bo vî karî, ji hev nayên veqetandin. Lê belê, di gel vê yekê, metoda xebatê jî divê zanistî be.

Taybetiyeke din a rojnamegeriyê, objektîvîte ye. Di çapemeniya nûjen a rojava de 'objektîvîte heye an na', dikare bê munaqeşekirin. Bi dîtina min tune, bes weke heye xwe daye pejirandin. Yanê ew ne objektîf be bûbe xwedî hêzeke wisa mezin, hinek jî bi saya pêkanîna van xeml û taybetiyên meslekî jî, bi teknikên profesyonel, bi lîstikên medyatîk û siyaseteke pir hostane reng û îmajeke wisa ji xwe re di nav raya giştî ya cîhanê de çêkiriye.

Bi vê yekê jî, tesîra xwe li ser raya giştî zêde kiriye û di destê komprador û sermayedaran de bûye çekeke bêhempa. Gelek caran, em dibînin ku, ev çapemenî, subjektîvîteya xwe an jî berjewendiyên çînekê wek objektivîte û wek berjewendiyên giştî bi teknîkên rojnamegeriyê bi me dide bawerkirin.

Bi kurtî, eger rojnamegerî ye.

agahdarî

Weşana Enstituya Kurdî Ya Brukselê

Berpirsiyar: Medenî FERHO
Redaksiyon: Kerîm BAQISTANÎ
Wezîrê EŞO - Ejder MEHEMED

Navnîşan:
Bonneelsstraat, 16 - 1210 Bruksel
Tel. 02.230 8930 - 230 34 02
Fax 02. 231 00 97

Nivîskar berpirsiyarên nivîsên xwe ne

www.arsivakurd.org